## DAWANAMEYÊN MAFÊ PENABERIYÊ YÊN BERÎ 20.7.2018 BI BERDEWAMÎ TÊN BIRÊVEBIRIN

Qanûna nû ya derbarê demên herî dirêj bo birêvebirina dawanameyên mafê penaberiyê 20.7.2018 ket kar. Li gor qanûnê dawanameyên 20.7.2018 û piştî hingê teslîmkirî nabe ku birêvebirina wan ji 6 mehan dirêjtir be. Eger dem dirêjtir be, Daîreya Koçberan yekser miştêrî agadar dike.

Bo dawanameyên berî 20.7.2018 teslîmkirî dema herî dirêj ya 6 mehan nayê bikaranîn.

### Qanûna nû dema birêvebirina dawanameyên berî 20.7.2018 dirêjtir nake

Daîreya Koçberan dawanameyên berî 20.7.2018 jî bi berdewamî dimeşîne li gel dawanameyên nûtir. Texmîna dema birêvebirina van dawanameyan di lêpirsîna mafê penaberiyê de hatiye diyarkirin.

### Agahiyên zêdetir bi çendîn zimanan li ragihandina miştêrîtiyê de

Agahiyên zêdetir derbarê guherandina qanûnê dikarî ji ragihandina li ser malpera me bixwînî: https://migri.fi/artikkeli/-/asset_publisher/20-7-alkaen-turvapaikkahakemusten-kasittelyaika-korkeintaan-6-kuukautta.

Ragihandina bo miştêriyan li çend zimanan hatiye wergerandin: https://migri.fi/esitteet-ja-julkaisut.